# TIRKÎYE | TURKEY

## USCIRF–RECOMMENDED FOR SPECIAL WATCH LIST

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF) encûmeneke azad û cotpartîyî ya DY ye ku di seranserê dinyayê de çavdêrîya serbestîya dînî û bawerîyê dike. USCIRF-a ku li ser hîmê Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) yê 1998ê avakirî ye, di seranserê dinyayê de ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê de standardên Navneteweyî bi kar tîne û ji serekî, wezîrê karen derve û Kongresê re salixê şîretên siyasete pêşkêş dike. USCIRF, dezgeheke ji Wezîrîya Dewleta DY cuda ye û azad e. Raporta Salane ya 2020ê encama xebatên yek salekê ya bibelgekirina binpêkirinên qadê û şîretên siyasetên ḥikûmeta DY nîşan dide. Raporta Salane ya 2020ê heyama ji Çileyê Paşîn ê 2019ê heta Çileyê Pêşîn ê 2019ê digire nava xwe lê di hin rewşan de hin bûyerên giring ên berî yan piştî vê heyamê jî tên xuyandin. Ji bo zanyarîya bêtir li ser USCIRFê li vê lînka sîteya înternetê binihêrin yan jî ji jimara têlefona 202-523-3240ê bi USCIRFê re êkser pêwendî daynin.

### BIDESTKETÎYÊN HÎMÎ

Di 2019an de li Tirkîyeyê siyasetên dewletê yên destwerdanê û sînorkirinê li ser tevgerên dînî dewam kirine û li dijî kêmanîyên dînî zordarî û bûyerên şiddete yên civatî eşkere bi awayekî xuyayî bêtir bûne û fikara ji rewşa serbestîya dînî hê bêtir bûye. Her wek salên berê, dewletê nehiştiye bijartinên endamên encûmenên weqfên nemislimanan bibin û bi awayê bi neheqî pêkanîna sînorkirinên nû yên li ser bijartina Dêra Apostolîk a Ermenîyan ev demeke dirêj e biderengîketî hê jî dest werdaye karen hundirî yên komên dînî. Wezareta Karên Hundirî di bijartina paşîn de nehiştiye hin kes bibin namzet; lêbelê di biryara Mehkemeya Destûra Bingehîn a tarîxa Adara 2019ê de hatibû nîşankirin ku destwerdanên weha serbestîya dînî binpê dikin. Dîsa daxwazên wan ên bi awayekî resmî wek perestingeh erêkirina cîhên kombûna (*cemevlerî*) ‘Elewîyên ku koma kêmanîyên herî mezin a dînî ne û cudakirina zarokên wan ji dersen dînî nehatin qebûlkirin; Mehkemaya Mafê Mirovan a Ewrûpayê (ECtHR) biryarin dabûn ku ev siyaset mafên ‘Elewîyan binpê dikin.

Kêmanîyên dînî yên Tirkîyeyê fikara xwe didin der ku zimanê tevgerên dewletê û siyasetên wê hinbihin dike ku rewşeke neyartîyê pêk tê û herweha tengijîn û dijwarîya civatî teşwîq dike. Destûrdarên dewletê û siyasetvan hê jî dijcihûtîyê û bilêvkirinên nefrete belav kirine û di seranserê salê de di warê rakirina qanûnên heqareta ji dînî re û pêşkêşkirina bijareyeke din ji bo leşkerîya mecbûrî destûrdayîna ji redda wicdanî de hîç bipêşketinek rû nedaye. Wek nimûneyê ku di Xwandingeha Keşeyan de wezîfedarên dînî nikarin bên hînkirin, pirsen bi cîhên dînî re têkildar ên ev demek e dirêj e dewam dikin hê jî nehatine biçarekirin. Di sala 2019an de çendîn car, tevlî çendîn tirban cîhên dînî û kulturî yên Ermenî, Suryanî û Rûman rastî xesar û pelişandineke ciddî hatin (car caran ji ber sersarîyê lê di heman demê de ji ber zordestîyê yan projeyên dewletê yên erêkirî yên avakirinê), cîhên pîroz ên ‘Elewîyan ên li bajarê Sêwazê ji ber destûrên kanzayên ku dewletê ji bo herêmê destûrsitandi, bi gefên heman awayî re rûbirû maye. Di Tebaxa 2019ê de Receb Teyîp Erdoxanê Serekkomarê Tirkîyeyê tevlî şahîya avêtina hîmê dêra Suryanîyên Ortodoks a dêra pêşîn a di tarîxa komara Tirkîyeyê de avakirî bûye. Lêbelê Erdoxan çendîn car gazî kir ku Ayasofyaya kevnar a ku bazîlîkaya Ortodoksê Rûm e û ji 1935an ve bi awayekî qanûnî muze ye dîsa bibe mizgeft. Di Çirîya Paşîn a 2019an de mehkemeyeka bilinda a Tirk jî biryarek derxist û destûr da ku muzeyeka bi navê Karîye (Chora) ya ku dereke kevnar a Ortodoksên Rûm dîsa bibe mizgeft; ev biryar jî dibe ku ji bo bi heman awayî mizgeftkirina Ayasofyayê bûbe nimûne.

Di seranserê salê de ḥikûmeta Tirk hê jî kesên bi Fethullah Gulenê mirovê dînî yê li DY dijî ve têkildar an bi têkildarbûnê tên gunehbarkirin ên bi gunehbarkirina ku ew alî derba eskerîya Temûza 2016ê kirine yan jî tevgerên terorîstî kirine ji wezîfeyên wan dûr xistine, xistine nezarete û girtine.

### LI HIKÛMETA DEWLETÊN YEKBÛYÎ (DY) ŞÎRETIN

- Li gora Qanûnê Azadîya Dînî yê Navneteweyî (IRFA) ji ber pêkanîn û çavgirtina ji binpêkirinên serbestîya dînî yên ciddî, tevlîkirina Tirkîyeyê li Lîsteya Çavdêrîya Taybet a Wezerîya Derve ya DY-yê;
- Di hemû kombûnên bi destûrdarên ḥikûmeta Tirk de, ji bo ji nû ve vekirina Xwandingeha Keşeyan a Ortodoksên Rûm û bi temamî pêkanîna ḥikûmeta Tirk a biryarên ECtHR-yê yên li ser serbestîya dînî û bawerîyê nûjenhiştina van mijaran di asta herî bilind de pêkirina serê; û
- Fermankirina ji Balyozxaneya DY ya Anqereyê û konsulxaneya wê ya Stenbolê û Edeneyê ji bo ew ji bo vekirina, ji nû ve bidestxistana, nûkirina û çavdêrîya tevgerên parastina cîhên perestina komên dînî û manewî û kulturî û giringîya wan a kevnare bi ḥikûmeta Tirk re hene hevkarîyê bikin.

Şîret li Meclisa DY:

- Li Tirkîyeyê nemaze ji ber dîn û bawerîyê bûyîna mebest, ji bo ku welatîyên DY û karkirên dîplomatîk ji lêpirsîna siyasî bên parastin û bi zorê pêdankirin bi destûrdarên Tirk ên berpirsîyar bên kirin, Derxistina Qanûnê Parastina Welatîyên DY û Karkirên Dîplomatîk ji Lêpirsîna Siyasî yê 2019an (S.1075)

## JÊDER Û ÇALAKÎYÊN SEREKÎ YÊN USCIRF-ê

- **Rûniştin:** Li Tirkîyeyê Serbestîya Dînî
- **Danxuyandina Çapemenîyê:** USCIRF, Avakirên Siyaseta DY Ji Bo Li Tirkîyeyê Têkildarbûna Wan bi Mijarên Serbestîya Dînî re Dewam Bike Teşwîq Kir
- **Danxuyandina Çapemenîyê:** USCIRF-ê gefên Erdoxanî yên guherandina statuya Ayasofyayê şermezar kirin

## Piştperde

Li gora CIA World Factbook-ê nifûsa Tirkîyeyê hema hema 82 milyon in û %99,8ê vê nifûsê xwe wek misliman bi nav dike û bi gumanan pirranîya wê ya %77,5an bi Îslama Sinnî ve girêdayî ye. Ji 10 heta 25 milyon kes xwe wek ‘Elewî (komeke ku ḥikûmeta Tirk wê ji mislimanên sinnî yên pirranî naxwaze cuda bike) bi nav dike. Nifûsa mayî ji %0,2yê ateîstan, Apostolîkên Ermenî, Bahaîyan, Ortodoksên Bulxar, Katolîkên Keldanî, Ortodoksên Yûnan, Şahidên Yehovayî, Cihûyan, Protestanan, Katolîkên Romayî, Katolîkên Suryanî, Ortodoksên Suryanî û ji komên din ên dînî pêk tê.

Destûra bingehîn a Tirk welêt wek dewleteke laîk bi nav dike û teqezîya wicdan, serbestîya dînî û serbestîya bawerîyê dike. Tevlî vî awayî ḥikûmeta Tirk bi rêya Serektîya Karên Diyanetê ya pêkhatinên dînî teftîş dike yan jî Birêvebirîya Tevahîya Weqfan a ku çalakîyên komên dînî bi rêk û pêk dike hem li ser pirranîya misliman û hem li ser komên dînî yên nemisliman kontroleke berfireh pêk tîne. Hin çavdêr Diyaneta bi serektîya Erdoxanê Serekkomar li derveyê welêt wek “navgîneke mebesta siyasî û îdeologîk a partîya xwe” bi nav dikin û dibêjin ew wek navgîna siyaseta derve neteweperwerîya Tirk û Îslama Sinnî bi kar tîne. Li Tirkîyeyê ji tu komeke dînî re statuya ḥiqûqî nehatiye dayîn. Her çend ji ber sebebên dînî cudakerî hatibe qedexekirin jî nemaze kesên mislimanên ne sinnî li cîhên karî bûyerên cudakerîyê dane zanîn.

## Destwerdana Dewletê ya Karên Dînî

Hikûmeta Tirk di proseyên cîhên birêvebirîya bijartina çendîn komên dînî de rol sitand û heta di hin rewşan de yekser pêçîya xwe xistê. Ji ber ku Serektîya Karên Diyanetê di seranserê welêt de ji wezîfedarkirina hemû meleyan berpirsîyar e, komên misliman bi serbestî ji keysa bijartina serekên xwe yên dînî bêpar bûn. Hat diyarkirin ku hin melayên ku ji fermamên Serektîya Karên Diyanetê re erê nekirine yan bi cîh neanîne ji wezîfeya xwe hatine dûrxistin. Hikûmet, her wek ji sala 2013ê ve, bi awayê nekirina pêkhatinên vîyana ji bo ketina bijartinê, hê jî nehiştiye li Tirkîyeyê endamên encûmenên nû yên weqfên nemislimanan bên bijartin.

Piştî ku Patrîkê Ermenî Mesrob Mûtafyan di Adara 2019an de mir, koma Ermenîyên Apostolîk, ji bo lidarxistina bijartineke pozîsyona patrîktîyê ya ew demeke dirêj bû dihat xwastin xwe kar kir. Mûtafyanê Patrîk ji ber nexweşînê ji sala 2008an ve nikaribû wezîfeya xwe bi cîh bîne, ji ber vî awayî kom, ji sala 2010an ve ji bo ku di şûna wî de yek bê wezîfedarkirin bijartin bê kirin arzûḥal dabûn ḥikûmeta Tirk. Hikûmet, di salên buhurî de hemû tevgerên ji bo bihevxistina bijartinê asteng kir û di Îlona 2019an de ji alîyê Wezareta Hundirî ve bi derxistina bihevxistineke nû ya wek her çend ji alîyê din ve biguncin jî kesên li derveyê welêt xizmet dikin namzetbûna wan qedexe be dîsa dest werdayê.

Kom, paşîya paşîn di Çileyê Paşîn ê 2019an de patrîkekî nû bijart.

## Tadedan û Şiddeta Li Dijî Kêmanîyên Dînî

Di seranserê 2019an de endamên komên cuda yên dînî û nîjadî yên kêmanî yên Tirkîyeyê bi kêmasî tevlî du kuştinan hem rastî gefên şiddete û hem jî şiddeta yekser bûn. Di meha Gulanê de Rûmê bi navê Zafîr Pînarî yê 86 salî li mala wî ya Gokçeadayê hat kuştin. Di Çîrîya Paşîn de mîsyonerê fileh û welatîyê Başûrê Koreyê Jînwook Kîm, li kuçeyên bajarê Diyarbekira başûrê rojhilat hat kêrkirin û kuştin. Li Stenbolê welatîyekî Ermenî, piştî ku peyameke bi çêr û yên di malê de wek “kafir” binavkirî hat nivîsandin bi du mehan, di derî de hat kêrkirin. Di 2019an de malen ‘Elewîyan çendîn car bi heman awayê nivîsên dîwaran û peyamên gefxwur hatin xerabkirin û di Çîrîya Paşîn de diz ket mala Patrîkê Ekumenîkê Konstantînopol Bartholomewê 1î. Di meha Adarê de kesekî nenas li Îzmîrê şûşeya agirî avêt Sînagoga Beth Israel; li gora xeberan meqamên xwecîhî ew kes girtin û bi gunehbarîya “zirardayîna cîhên perestinê” ew kes desteser kirin.

## Sûcên Piçûkxistina Nirxên Dînî

Tirkîye car caran hin kesan li gora madeyê 216 (3)yê Qanûnê Cezayî yê “eşkere piçûkxistina nirxên dînî yên beşek ji gelî erê kiriye” ceza dike hin kes bi piçûkxistinê gunehbar kirine. Di

Gulana 2019an de leyîstikvana Tirk Berna Laçîn ji gunehbarîya sûcên ku wê bi peyamên çapemenîya civatî nirxên dînî piçûk xistiye serbest ma; destûrdar xwe li ser vê biryara serbestmayînê neqayîl kirin lê di paşîya dewra raportkirinê de di Çileyê Paşîn ê 2020î de biryara serbestmayînê hat tesdîqkirin. Her wek wê yekê destûrdar di Çileyê Pêşîn ê 2019an de du karkirên herêmî yên Konsolosxaneya DY ya Edeneyê ji ber vîdyoyeke ku "henekê xwe bi nirxên Îslamî dikin", girtin. Her çend destûrdar lêpirsînekê dabin destpêkirin jî hat dîyarkirin ku ew kes piştî demeke kin serbest hatine berdan.

## SIYASETA HÎMÎ YA DY

DY û Tirkîye hevkarên stratejik in û wek endamên Lihevkirina Bakurê Atlantîkê (NATO) têkilîyên nêz bi rê ve dibin. Lêbelê ev têkilî wek salên bere di 2019an de jî tengijîna xwe dewam kirin. Di 6ê Çîrîya Pêşîn a 2019an de Serek Donald J. Trump diyar kir hêzên DY ji bakurê Sûrîyeyê vekişîyane û ber bi herêmê ve keysa tevgereke leşkerîya Tirk peyder bû. Piştî tevgera dagîrkerîyê ya yek alî ya ber bi Sûrîyeyê ve û ji ber fikarên sûcên şerî û bivênevêya ji nû ve zindîbûna DAÎŞê Serek Trump, ji bo pêdankirina bi destûrdarên Tirk ên rewşa Sûrîyeyê xerabtir dikin bide kirin, bêtirkirina bacên li ser polayê Tirk û rawestandina dan û sitandinên bazirganîyê biryarnameyekê derxist (EO 13894). Wezîrîya Gencîneya DY paşê da zanîn ku du wezîrîyên Tirk û sê wezîrên Tirk hatine xistin nava çarçoveya Biryarnameya Qanûnî (EO). Di wê mehê de Alîkarê Serekî Michael R. Pence û Wezîrê Karên Derve Michael R. Pompeo ji bo dan û sitandina li ser rawestandina şerê 120 seetî yê bi şertê parastina kêmanîyên dînî û nîjadî yên her du hikûmetan  li Sûrîyeyê serî li Anqereyê da. Di Çîrîya Paşîn a 2019an de Serekkomar Erdoxan, tevlî ewlehîya kêmanîyên filehan ên li sînorê Sûrîye-Tirkîyeyê jî di nav de ji bo dan û sitandina ser mijara Sûrîyeyê serî li Koşka Sipî xist û bi Serek Trump û hin endamên Senatoya DY re da û sitand.

Di Hezîrana 2019an de Wezîr Pompeo û Sefîrê Serbestîya Dînî yê Navneteweyî Samuel D. Brownback gazî ḥikûmeta Tirk kir ku ew Xwandingeha Keşeyên Ortodoksên Rûm ji nû ve veke. Di Çileyê Paşîn ê 2020î de piştî demeke kurt a dewra raportkirinê Sefîr Brownback, ji bo bi Bartholomeosê Patrîk re dan û sitandina mijarên serbestîya dînî çû Tirkîyeyê.